# Aşti Ne ji Xweliyên Zimanan, Ji Azadiya Zimanan Şîn Dibe

Yek ji bingehên herî esasî yê hebûna gelan azadiya zimanî ye. Ji ber vê yekê têkoşîna li dijî polîtîkayên inkâr, asîmîlasyon û tasfiyeyê yên ku li dijî mafê zimanê dayikê tên meşandin, berî her tiştî, pêdiviyeke jêneger a mirovbûnê ye. Zimanê dayikê bîr, nasname û bingeha hebûna azad a gelan e.Parastina vî mafî şertê jêneger ê jiyaneke wekhev, azad û demokratîk a civakî ye. Civakeke ku ji zimanê xwe yê dayikê tê qutkirin, ne tenê bi windakirina zimanekî re; di heman demê de bi xetereya windakirina dîrok, çand, rastiya xwe ya neteweyî û civakî jî re rû bi rû dimîne.

Li Tirkiyeyê têgihiştina netew-dewletê ya yekpare û navendperest a tund, wek duh îro jî li dijî hebûna zimanî û çandî ya gelan polîtîkayên inkâr, asîmîlasyon û tasfiyeyê didomîne. Tevî hemû têkoşîn û daxwazên civakî yên gelê Kurd, polîtîka û sepandinên ku li dijî hebûna gel a zimanî û çandî tên meşandin mînaka herî aşkera ya vê rastiyê ye.

Li Tirkiyeyê di encama polîtîkayên inkâr û asîmîlasyonê de gelek zimanên kevnar gihiştine sînorê windabûnê û ev xetere her roj zêdetir dibe. Ubixî û Yewnaniya Kapadokyayê bi tevahî winda bûne; Zaravayê kevnar ê Kurdî Zazakî/Kirmanckî, herwiha Lazî, Hemşînî, Abazayî, Çerkezî, Suryanî, Yewnaniya Pontusê, Ermeniya Rojavayî û Romanî jî bi xetereyeke micîd a winda bûnê re rû bi rû ne.

Civaka demokratîk jiyaneke wisa ye ku cudahiyan înkar nake, azadiya wan diparêze. Azadiya zimanî rêgeza bingehîn a vê jiyanê ye; hemû mafên derbarê zimanê dayikê de jêneger in. Aştiya civakî ne bi ferzkirina yekperestiyê, li ser bingeha wekhevî û azadiyê bi nasîna ziman, nasname û çandan pêk tê.

Ji ber vê yekê, divê mafê hemû gelan ê fêrbûn, bikaranîn, pêşxistin û wek zimanê perwerdehiyê hilbijartina zimanê dayikê were misogerkirin. Divê jiyana giştî bi têgihiştineke pirzimanî û wekheviyê ji nû ve bê birêkûpêkkirin. Aştiyeke dadwer û civakeke demokratîk tenê li ser bingeha ku ziman azad in dikare were avakirin.

Di çarçoveya Pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk a ku di serî de Birêz Abdullah Ocalan bi hewldanên gelek derdoran heta îro hatiye de, di derbarê vesazkirinên zagonî yên li Meclîsê ku dê bên kirin de hêvî û daxwazên gelê Kurd û hemû gelan aşkera û zelal in. Divê têgihiştinên hiyerarşîk, yekperest, derker, qedexeker û bişavker bi dawî bibin; ne ku hiqûqa serdestan, divê hiqûqa wekhevan bê damezrandin. Di navbera zimanan de ne serwerî, divê aşti; di navbera nasnameyan de ne serdestî, divê wekhevî bê avakirin. Ji bo aştiya civakî, di serî de perwerdehiya bi zimanê dayikê, divê mafên zimanî bên temînkirin û statûya zagonî bê misogerkirin.

Parastina azadiya zimanan, avakirina azadî û aştiyê civakê ye. Bi boneya 21ê Sibatê Roja Zimanê Dayikê ya Cîhanî em carek din dubare dikin: Azadiya ziman bingeha civaka demokratîk û aştiya birûmet e.
Ji ber vê yekê, em gazî hemû kesan dikin ku têkoşîna zimanê dayikê bilind bikin.

Ji hemû zimanan re Wekhevî û Azadî!
Zimanê Dayikê Hebûna Me, Nasnameya Me û Rûmeta Me ye.